

# Nasandina Giştî ya Edebiyata Dînî ya Kurdên Yarsanî

Shahab VALI\*

Wergera ji Frensî: Sevda Orak Reşitoğlu\*\*

Piraniya kurdan misilmanên sunnî ne, lê di nav wan de baweriyên din jî hene, wek êzdîtî û Yarsanî ku yênan Yarsan wek *Kakeyî* û *Ehl-i Heqq* jî têne zanîn.<sup>1</sup>

Dînê Yarsanî bi piranî li Rojhilata Kurdistanê tê bawerkirin, li herêma Kermanshah, Îlam û her wiha li Azerbeycan, Loristan<sup>2</sup> û cihên din ên Îranê jî tê bawerkirin<sup>3</sup>. Ev dîn li Başurê Kurdistanê jî, li bajarên wek Kerkuk, Xaneqîn, Silêmanî belav bûye. Doktrînen dînê Yarsanî li ser *dûnadûn* (kirasguhertin) û xuyabûna îlahî<sup>4</sup> ava bûye, bingeha vî dînî di kelimên Yarsanan de xuya dike ku ev kelim demeke dirêj bi devkî ji nifşekê derbasî nifşeke din bûye.

\* **Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Turkiye** / Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Living Languages Institute, Kurdish Language and Culture Department, Mardin, Turkey. e-mail: vali.shahab@gmail.com

\*\* **Wanebêj, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Turkiye** / Lecturer, Mardin Artuklu University, Living Languages Institute, Kurdish Language and Culture Department, Mardin, Turkey. e-mail: sevdaorak@yahoo.com

1 bnr: "Bibliographie sélective de l'Islam kurde", dans Martin van Bruinessen et Joyce Blau (éd.), *Islam des Kurdes, les annales de l'autre Islam*, No: 5, Publication de l'ERISM, INALCO, Paris, 1998, rr. 371-382

2 Ji bo Loristan bnr: Edmonds, C. J., "Luristan: Pish-i Kuh and Bala Gariveh", *G.J.*, vol. 59, No. 6, (juin 1922), rr. 437-451

3 Minorsky, W., "The Tribes of Western Iran", in *TJRAIGBI*, vol., 75, No: 1/2, (1945), r. 79

4 During, J., "Avrupa ve Iran'daki Ehl-i Hak Araştırmalarının Eleştirel Bir Değerlendirilmesi", dans *Alevi Kimliği*, Olsson, T., Özdalga, E., Raudvere, C. (éd.), Tarih Vakfı Yurt, çeviri: Bilge Kurt Torun, Hayati Torun, İstanbul, 1999, r. 128

Edebiyata mîstîk û batînî ya Yarsanan bi gelemperî bi zaravayê goranî ava bûye, lêbelê di edebiyata Yarsanan de, çend kelimên soranî û Farisî jî hene. Her wiha di kelimên Yarsanan de fikr, bawerî û ayînên wan dikare bê dîtîn. Şêwaza wan a helbestî, ku ji edebiyata Farisî pir ne cuda ye, esas wek rêya îfadekirinê ye ku ji aliyê fikr û şêwazên estetîk ve li hev dikin.

Kevneşopiya Yarsanan xwe dide aliyê îlahî yê metnên xwe, ev metn ne tenê wek wehiyên rastîn têne dîtîn, her wiha wek gotinên kesên teofanîk jî têne hesabandin. Ev *kalam* melodîk in û bi *tenbûrê* têne gotin.

Li gorî kevneşopiyê, *tenbûr* di sed sala Xmin de ji aliyê Şah Xoşîn ve wek “sazê pîroz” hatiye hilibjartin da ku tevî ayînên dînî bibe.

Bi gihastina helbest û muzîkê, mirov dikeve rewşeke wisa ku, hem ji xwe diçe, hem serxweşiyek pê re çêdibe hem jî batiniyê nas dike<sup>5</sup>.

Kêşeya herî giring bi xebata van metnan berawirdkirina dîroka wan e, lewre dîroka nivîsîna van ne diyar e. Li gorî Mohammad Mokri, dîroka nivîsîna van kela-man nehatiye qeydkirin da ku pîrozbûna gotinan xira nebe<sup>6</sup>. Ev pirsgirêk bêguman dê çareser nebe, lewre ne em dikarin dîroka rastîn a derketina kelaman bibînin, ne jî dikarin dîroka zayîn û an jî mirina xwediyên wan bibînin. Li gorî Jean During, wisa xuya dike ku metna herî kevn a ku hatiye qeydkirin wek 1770 hatiye nîşandan<sup>7</sup> lê li nav Yarsanan de destxetên gelek kevintir jî hene.

Di kevneşopîya Yarsanan de her helbest wek *kalam* tê binavkirin. Koka vê peyvê erebî ye; *kalâma* (gotin, logos) û di Qur'anê de sê caran derbas dibe, wek *kalam Allah*, yanî gotina Xwedê. Ev Gotin “rastiyê diparêze û şaşiyê radike”<sup>8</sup>. Li gor Yarsanan, bi rêya kelaman, “Sirr xuya dibin” û bi awayekî devkî derbasî nîşên din dibin<sup>9</sup>.

*Kalam* di *Defter* de têne qeydkirin<sup>10</sup>. *Defter* bi wateya gelemperî lîstîk an jî kitêba hesaban e, ku her tiştê de tê qeydkirin<sup>11</sup>. Di kevneşopîya Yarsanan de, her *defter* aîdê kesekî pîroz e an jî aîdê tevahiya serdemeke diyar e.

5 Ji bo muzîka Yarsanî bnr: During J., *Musique et Mystique dans les Traditions de l'Iran*, Institut Français de Recherche en Iran, Paris-Téhéran, 1990, During, J., *L'âme des sons*, éd. du Relié, 1990

6 Mokri, M., *La Grande Assemblée Des Fideles de Vérité au tribunal sur le Mont Zagros en Iran (Dawra-y Dîwâna Gawra)*, Livre Sacré et Inédit en Gourani Ancien, texte critique, traduction, introduction et commentaires avec des notes linguistiques et glossaire, Etudes d'Hérésiologie Islamique et de Themes Mythico-Religieux Iraniens, Librairie Klincksieck, Paris, 1977, r. 16

7 During, *h.b.*, r. 128

8 Amir-Moezzi, M. A., (sous la direction de), *Dictionnaire Du Coran*, Robert Laffont, Paris, 2007, r. 648

9 Mir-Hosseini, Z., “Redefining The Truth: Ahl-i Haqq and Islamic Republic Of Iran”, in *BJMES*, vol. 21, No: 2 (1994), r. 213

10 Sûrî, M., *Sorûdhây-e Dînî Yarsan*, Entesaratê Amir Kabir, Tehran, 1344/1965, r. 18

11 Rajabzadeh, H., “Daftar”, *Encyclopaedia Iranica*, vol. VI, Mazda Publishers, 1993, r. 563

Li gorî kevneşopiyê, yekemîn kelimên mîstîk-batinî, kelimên serdema Behlûl e ku wek *Defterê Dewreyê Behlûl* tê binavkirin. Ev *kelam* yên Behlûlê Madiyê kesayetê efsanewî û yên alîgirên wî ne û di sedsala duyemîn a koçî de hatine gotin.<sup>12</sup> Dîsa li gorî kevneşopiyê, *kelamên* serdema Behlûl yên herî kevn in û wek destpêka edebiyata pîroz a Yarsanan têne nişandan.

*Dewreyê Behlûl* deftereke biçûk e ku bi ristîkên dehheceyî, bi zaraveya goranî hatiye nivîsîn û pir kevn e. Digihîje sedsala XVII mîn<sup>13</sup>. Yên ku di vê serdemê de kelimên gotine ev in: Baba Lore, Baba Receb, Baba Hatem û Baba Nocûm.

Serdema duyemîn a *kelaman*, ya Baba Serheng e û wisa tê qebûlkirin ku Baba Serheng di serdema sêyemîn a koçî de jiyaye. Xwediyê *kelamên Defterê Dewreyê Baba Serheng* ev in: Baba Serheng, Baba Ruhtâf, Qelem, Rûm, Xunkar, Yerenc, Neva, Qeysar, Gerçek, Sebûre, Tebrîz û Serenc.

Serdema sêyemîn a *kelaman* ya Şah Xoşîn û alîgirên wî ne û wek *Defterê Dewreyê Şah Xoşîn* tê binavkirin. Ev serdem yek ji serdemên herî girîng a Yarsanan e û wisa tê qebûlkirin ku *kilamên* vê serdemê di sedsala çaremîn a koçî de hatine gotin. Di nav van *kelaman* de yên Baba Tahirê Hemedanî (sedsala IX mîn) jî hene ku li gorî kevneşopiyê Yarsanan Baba Tahir yek ji ferîştayên Şah Xoşîn e. *Kelamên* Baba Tahir wek “Çarînên Baba Tahir” hatine xebitîn û ev xebat bi versiyonên cuda hatiye çapkirin. Ji xeynî vê, bi taybetî, di *deftera* vê serdemê de yên Farisî jî hene.

Kevneşopiyê gotina *kelaman* bi Baba Nawis (sedsala XI mîn) û alîgirên wî berdewam dike.

Li gorî baweriyê Yarsanan, metnên vê edebiyata batînî ji aliyê Sultan Sehak û alîgirên wî ve hatine berhevkirin di sedsala XIV mîn de. Her wiha *kelamên* serdemên berê jî hatine tomarkirin. Her xwedê *dûnê* (*kiras, laş*) xwe eşkere kiriye û Pîr Mûsiyê, nivîsevanê Sultan Sehak, aliyê wan ê batînî û zahirî qeyd kirine. Tevahiya *kelamên* vê serdemê wek *Defterê Perdîwerî, Dîwana Gewre, Kelamê Xezane* an jî *Nameyê Serencam* tê binavkirin.

*Defterê Perdîwerî* ji beşên cuda pêk tê û tê de gelek beşên dîroka pîroz a Yarsanan heye ku pir ketiye nav hev. Beşên cuda yên ku *Defterê Perdîwerî* pêk tînin ev in:

*Barge Barge*, ji aliyê heftê û du Pîran ve heftê û du kelimên hatine gotin. Bi goranî hatine gotin û ev beşa herî girîng a *Defterê Perdîwerî* ye. Behsa heftê û du Bargeyê îlahî tê kirin di vê beşê de, ku her yek hatiye herêmeke cihê li ser rûyê erdê. Li ser panteîzm, pêxember û lehengên mîtolojîk ên Îrana kevn agahî hene di vê beşê de.

12 Vali, Shahab, *Les Yârsân, Aspect Mythologiques – Aspect Doctrinaux*, Editions Universitaires Européennes, Saarbrücken, 2011, rr. 41-43

13 Mokri, M., *Cycle des Fideles Compagnons A L’Epoque de Buhlul (Dawra-y Buhlûl)*, étude d’hérésologie islamique et de theme mythico-religieux iranien, Appendice Dawra-y Buhlûl, metna goranî ji aliyê M. Mokri ve hatiye amadekirin û wergerandin, Contribution Scientifique aux études iraniennes, Tome 5-Fascicule 4, Paris, 1974, rr. 7-8

*Dewreyê Heftewane* “yên ku xwedî heft nişanên îlahî” ne. Çêbûna wan, hebûna wan a beriya Afirandinê tê behskirin. Ev metn jî bi goranî hatiye nivîsîn.

*Gelîm wa Kûl* (yê ku xalîçeya raçandî hildigire ser milên xwe) li ser çîroka jiyan, pakbûn û vejîna Pîr Binyamîn e ku ev ferîşte di nav Yarsanan de sembola Cebrail e. Her wiha di vê beşê de gera wî ya tevî alîgirên wî ya ber bi Yemen û Misrê ve tê behskirin<sup>14</sup>. Pîr Binyamîn her wiha wek *Gelîm wa Kûl* jî tê binavkirin.

*Dewreyê Çiltan* beşek din a Serencam e. Li gorî vê beşê cihan ji ronahî û tariyê pêk tê. Beriya afirandina dinya, roj, heyv û stêrkan, du kevirên sereke hebûne: ronahî û tarî, ku ev her du li hev nekirine. Xwedê çil ronahî (*Çiltan*) afirandiye ji ronahiya Xwe, ji bo ku tariyê bitemirîne. Ev beşa Serencamê di baweriya Manîehîstan de jî heye. Ev çil ferîşte ji aliyê Xwedê ve hatine afirandin da ku di serdema Sultan Sehak de alîkariya wî bikin<sup>15</sup>.

*Xurd-a Ser Encam* behsa ayîn, qanûn, seremoni, ziyaret û rêbazên standart dike û bi goranî hatiye tomarkirin.

*Defterê Abidîn* ya Abidînê Cafê. Kurdekî sunnî ye ku li hemberî Sultan Sehak derdiket û diji Sultan bû lê: “Şevkê di xewna xwe de Xwedê dibîne ku ew Xwedê ji keynî Sultan Sehak ne kesek din e. Radibe û diçe cem Sultan Sehak, tobe dike û dibe yek ji nêzikên wî.” Di *kelamên* xwe de behsa exlaq, çandini û bi taybetî jî behsa giyayekî pîroz dike: *soma* bi Kurdî û *haomaya* zerdûştan, giyayekî pîroz e û di ayînên wan ên dînî de tê bikaranîn. Ev metn bi soranî hatiye gotin.

Metnên din ên pîroz ên ku *Defterê Perdiwerî* pêk tînin ev in: *Dewreyê Pîr ‘Elî*, *Dewreyê Damyar*, *Dewreyê Şah Weys Qulî* (1407?), *Defterê Sawa* û *Zulal Zulal* a Baba Yadigar û Şah Îbrahîm.

Metnên dinî yên Yarsanan ên wekî din jî hene: *kelama* Seyîd Xamûş (1440), *kelama* Îl Begî Caf (1492-1553)<sup>16</sup>, *kelama* Xan Elmas, *deftera* Şêx Emîr (1713)<sup>17</sup>, *deftera* Derwîş Zulfîkar (1835-1915), *deftera* Derwîş Qolî (1820-1898)<sup>18</sup>.

Ev kalam bi gelemperî bi goranî hatine gotin. Lê yên Farisî (bi taybetî yên Şah Xoşîn) an jî yên tirkîya azerî jî hene, yên wek Qûşçî Oglî.

Yek ji beşên herî girîng ên van metnan *deftera* serdema *Yerî Tanî* an jî *deftera*

14 Ev metn jî aliyê Evreng-Hâdimî ve jî hatiye weşandin, Tehran, 1978

15 *Safzâdeh, S, Nâmeh Sar Anjâm, Kalâm-e Khazâneh, yeki az motûn-e kohan-e Yarsan*, Entezarâtê Hîrmand, Tehran, 1375/1996, rr. 390-391

16 Jî aliyê Safzade ve hatiye weşandin, éd. Bahâr, Senendec, 1981

17 Jî aliyê Mokri ve hatiye weşandin, *Cinquante deux Versets de Cheikh Âmir en dialecte Gûrânî*, JA Paris, rr. 391-422. Her wiha di *Contribution Scientifique aux études iraniennes*, Paris, 1970, rr. 199-230. Jî aliyê Niknejad, S. K. ve jî hatiye weşandin, *Diwân-e Sheikh Âmir*, her wiha jî aliyê Timurian ve hatiye weşandin, S., 1985 û jî aliyê S. A. Şah Ibrahimî ve hatiye wergerandin.

18 Jî aliyê Safzade ve hatiye weşandin, éd. Atayî, Tehran, 2002

sih û şeş şairan e. Alîgirên Seyîd Brake (1795-1863) ev kelim gotine. Serdema *Yerî Tanî* serdema herî biriqî ya dîroka Yarsanan e: di vê *defterê* de doktrîna wan tê ravekirin, şîrovekirin û nivîsîn. Digel girîngiya wê, li ser *deftera* vê serdemê hê jî tu xebat nehatiye kirin. Şairên *kelamên* serdema *Yerî Tanî* sih û heft heb in.

Kelamên Yarsanan, ku bi kevneşopîya helbestî ya mîstîk a misilmanan xwedî xalên hevpar e<sup>19</sup>, li ser ravekirina doktrînên xwe û fikrên kevneşopîya xwe disekine ku yê bingehîn *dûnadûn* (kirasguhertin) û *Ruhê îlahî* (Zat) ye ku di bedena kesên pîroz de xuya dibe.

Em bi gelemperî dikarin bêjin ku mijarên sereke yê metnên dînî yê bawerîya Yarsanan ev in:

- Rave û şîroveya doktrîn, fikr û ramana bawerîya taybet a Yarsan
- Raveya “Xwe xuyakirin” a Hebûnên Yezdanî
- Ferîştênasiya Yarsan
- Ayîn û seremoniyên Yarsan
- Apokalîpsa şerê dawî ya dinyayê
- Mîtolojiya kurdan
- Efsaneyên kevin ên dinyaya Îranî
- Dînê Zerduşt, kesayet û bawerîya wan
- Dîroka Îranê ya beriya îslamê
- Kesayetên îslamî

Ligel xebat û lêkolînên li ser edebiyata dînî ya Yarsanan, dikare bê gotin ku ev edebiyat, beşeke giring, kevin û bingehîn e di edebiyata dînî ya Kurdî de. Bêguman edebiyata Yarsanî, beşa herî nenasrwa edebiyata Kurdî ye. Xebatên bingehîn ên li ser vê edebiyatê dikare bibe alîkar ji bo dewlemendkirina têgeh û peyven dînî, felsefî û edebî ya zimanê Kurdî.

19 Mir-Hosseini, Z., “Faith, Ritual and Culture among the Ahl-e Haqq” in *Kurdish Culture and Identity*, Edited by Kreyenbroek, P. & Allison, C., Zed Books, UK, 1996, r. 118

## Bibliyografya

- Amir-Moezzi, M.A., (sous la direction de), *Dictionnaire Du Coran*, Robert Laffont, Paris, 2007
- Ardalan, Sh., *Les Kurdes Ardalan entre la Perse et l'Empire Ottoman*, Librairie Orientaliste Paul Geuthner, Paris, 2004
- Van Bruinessen, M., "Bibliographie Sélective de l'Islam Kurde", dans Martin van Bruinessen et Joyce Blau (éd), *Islam des Kurdes, les annales de l'autre Islam*, No. 5, Publication de l'ERISM, Equipe de Recherche Interdisciplinaire sur les Sociétés Méditerranéennes Musulmanes, Institut National des Langues et Civilisations Orientales, Paris, 1998
- Defter-e Perdiwarî*, Exemplaire copié par 'Alî Mîr Darvîshî, 1347/1968
- Dervîş Fârex Kermanşahî, *Defter* (Kelâm), exemplaire copié par Mârîf Amîrî, relu et corrigé par Seyyed Ebbas Damen Efşan et Taher Yârweşî, 1373/1994
- During, J., "Avrupa ve İran'daki Ehl-i Hak Araştırmalarının Eleştirel Bir Değerlendirmesi" dans *Alevî Kimliği*, Olsson, T., Özdalga, E., Raudvere, C. (éd), Tarih Vakfı Yurt Yayınları, çeviri: Bilge Kurt Torun, Hayati Torun, Istanbul, 1999
- During, J., *Musique et Mystique dans les Traditions de l'Iran*, Institut Français de Recherche en Iran, Paris-Tehran, 1990/ During, J., *Lâme des sons*, éd. du Relié, 1990
- During, J., "Notes Sur L'Angéologie Ahl-e Haqq", dans *Synchrétismes et Hérésies dans l'Orient Seldjoukide et Ottoman (XIVe-XVIIIe siècles)*, Actes du Colloque du Collège du France, octobre 2001, sous la direction de Gilles Veinstein, Peeters, 2005
- Elqâsî, M., *Âyin-e Yârî*, s.d., s.1
- Hosênî, S.M., (éd), *Dîwana Gewra*, Entesharat-e Bax-e Ney, Kermanşa, 1382/2003
- Kreyenbroek, "Mithra and Ahriman, Binyâmin and Malak Tâwûs" traces of an ancient myth in cosmogonies of two modern sects", dans *Recurrent Patterns In Iranian Religions: From Mazdaism to Sufism*, sous la direction de Philippe Gignoux, Association pour l'avancement des Etudes Iraniennes, Paris, 1992
- Minorsky, W., "The Gûrân", *BSOAS*, University Of London, vol. 11, no. 1 (1943)
- "The Tribes of Western Iran", in *TJRIGBI*, vol. 75, no. 1 et 2 (1945)
- "The Sect of the Ahl-i Hakk" in *Iranica*, *Twenty Articles*, Publication of the University of Tehran, vol. 775, 1964
- Mir-Hosseini, Z., "Faith, Ritual and Culture among the Ahl-e Haqq" in *Kurdish Culture and Identity*, Edited by Kreyenbroek, P. & Allison, C., Zed Books, UK, 1996
- "Redefining The Truth: Ahl-i Haqq and Islamic Republic Of Iran", in *BJMES*, vol. 21, no. 2 (1994)
- Mokri, M., *Cycle des Fidèles Compagnons à l'Epoque de Buhlul (Dawra-y Buhlûl)*, étude d'hérésiologie islamique et de thème mythico-religieux iranien, Appendice Dawra-y Buhlûl, texte gorani établi, traduction, notes et commentaires par M. Mokri, Contribution scientifique aux études iraniennes, tome 5-Fascicule 4, Paris, 1974
- La Grande Assemblée des Fidèles de Vérité au tribunal sur le Mont Zagros en Iran (Dawra-y Dîwana Gawra)*, Livre Sacré et Inédit en Gorani Ancien, Texte Critique, Traduction, Introduction et Commentaires avec des Notes Linguistiques et Glossaire, Etudes d'Hérésiologie Islamique et de Thèmes Mythico-Religieux Iraniens, Librairie Klincksieck, Paris, 1977

- Le Chasseur de Dieu et le mythe du Roi-Aigle (Dawra-y Dâmyârî)*, Texte établi, traduit et commenté avec une étude sur la chasse mystique, le temps cyclique, et des notes linguistiques, Otto Harrassowitz, Wiesbaden, 1967
- Mokri, M., “Le Kalâm Gourani sur Le Cavalier au Coursier Gris, Le Dompteur du Vent”, Extrait du *JA*, Année 1974
- “Notes sur la Généalogie des Fondateurs de la secte des Fidèles de Vérité (Ahl-i Haqq) d’après un manuscrit inédit de source sunnite”, *JA*, tome CCXXXII, No. 1, Paris, 1994
- Monnot, G., “La Transmigration et l’Immortalité” dans *Islam et Religion*, Maisonneuve & Larose, Paris, 1986
- Oberling, P., “Kurdish Tribes”, *Enc. Ir.*, www.iranica.com/newsite, 2004
- Rajabzadeh, H., “Daftar”, *Encyclopaedia Iranica*, vol. VI, Mazda Publishers, 1993
- Safîzâdeh, S., *Dâneshnâme Nâmâvarân-e Yarsan, Ahvâl va Âthâr-e Mashâhîr, Târikh, Ketâbhâ va Estelâhât-e ‘Irfânî*, Enteshârat-e Hîrmand, Tehran, 1376/1997
- (éd.), *Dowray-e Haftawâna, Jozvî az Nâmeh Minavî Sar Anjâm*, Ketâbkhâneh Tahûrî, Tehran, 1361/1382
- (éd.), *Nâmeh Sar Anjâm, Kalâm-e Khazâneh, yeki az motûn-e kohan-e Yarsan*, Enteshârat-e Hîrmand, Tehran, 1375/1996
- Şeyx Emîr, *Kelam*, Exempleire édité par Hosên Rûhtafî, copié par Seyyed Êmân Xâmûşî, Sahneh, 1379/2000
- Sûrî, M., *Sorûdhây-e Dînî Yarsan*, Enteshârat-e Amir Kabir, Tehran, 1344/1965
- Tabîbî, H., “Tathîr-e Haft Amshâspand dar Âyîn-e Kordân-e Ahl-e Haqq”, dans *Zamîneh Majalleh Barrasî hây-e Târikhî*, Shomâreh 3, Sâl-e 6
- Tahmâsebi, Q. (éd), *Sar Anjâm, Bayân al-Haqq*, exempleire inédit
- Valâyî, M., *Ahl-e Haqq Che Mîguyad?, Châp-e Golshan*, Tehran, 1373/1994 Yasami, R., *Kurd va Peyvastegiy-e Nejhâdî va Târikhî Û*, Enteshârat-e Ebn-e Sînâ, 3ème éd., s.d., s., 1
- Vali, Shahab, *Les Yârsân, Aspect Mythologiques – Aspect Doctrinaux*, Editions Universitaires Européenes, Saarbrücken, 2011
- Zarrînkûb, A, *Do Qarn Sokût*, Enteshârat Sokhan, 16ème éd., Tehran, 1381/200